

# NIRXANDINA VEGÊRANA JIYANNAMEYEKÊ: JIYANEK Û DU ROMANÊN OTOBİYOGRAFİK ÊN EREBÊ ŞEMOYÎ

**Güneş Kan**

Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê,  
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî,  
rojxun@hotmail.com, <https://orcid.org/0000-0002-7097-6047>

**Article Types / Makale Türü:** Research Article / Araştırma Makalesi

**Received / Makale Geliş Tarihi:** 28 Ocak 2024 **Accepted / Kabul Tarihi:** 28 Nisan 2024

**DOI:** 10.26791/sarkiat.1426978

## Nirxandina vegêrana Jiyannameyekê: Jiyaneke û Du Romanên Otobiyoğrafîk Ên Erebe Şemoyî

### Kurte

Di maweya jiyana Erebe Şemoyî (1897-1978) da li cîhanê rûdan û geşedanên gelek mezin qewimîne, guherîn û veguherînên bingehîn çêbûne. Digel şahidiyê wî bi xwe jî di gelek rûdanên dema xwe da bi awayekî aktîf rol dîtiye. Serboriya şexsî ya nivîskarî, rewşa dîrokî, çandî, etnik, aborî û sosyo-polîtîk a herêmên lê jiyaye, serboriya jiyana nivîskarî hewceyî veguhaztîne dike bo nîfşên bê. Erebe Şemo di 1935an da romana xwe ya otobiyoğrafîk, Şivanê *Kurmanca* dinivîsîne. Di berhemê da bîranînên xwe yê zarokati û xortaniyê vegêrane, bi awayekî kurt behs ji serpêhatiya malbatê ya berî xwedêdana xwe jî kiriyê. Nivîskar di 1958an da bi navê *Berbangê* romaneke din a otobiyoğrafîk diweşîne. Lêbelê ev roman yekser ne berhemeke nû ye. Lewma dema vegêrayî ya romanê, bi dema vegêrayî ya Şivanê *Kurmanca* ra yek e, lê nivîskarî li hin cihan destwerdan li vegêranê kirine. Di vê gotarê da tê vekolan ka Erebe Şemoyî çima xwestiye serboriya xwe vegêre, jê giringtir çima pêwîst dîtiye jiyana hatiye vegêran -bêyî ku sînorên dema vegêrayî berfireh bike-careke din vegêre. Herweha hatiye nirxandin ka nivîskarî çiqasî jiyana xwe vegêraye, çiqasî venegêraye û çima venegêraye.

**Bêjeyên Sereke:** Erebe Şemo, romana otobiyoğrafîk, destwerdan, Şivanê *Kurmanca*, *Berbang*.

## Bir Yaşam Öyküsünün Anlatımı: Bir Yaşam ve İki Otobiyoğrafîk Roman

### Öz

Erebe Şemo'nun (1897-1978) yaşadığı dönemde dünyada çok büyük olay ve gelişmeler meydana gelmiş, temel değişim ve dönüşümler yaşanmıştır. Şemo, tanık olmanın yanı sıra döneminin birçok olayında aktif bir biçimde rol oynamıştır. Yazarın kişisel yaşam yolculuğu, yaşadığı bölgelerin tarihsel, ekonomik, kültürel, etnik, sosyo-politik durumu yazarın yaşam öyküsünün gelecek kuşaklara aktarımını gerekli kılmıştır. Erebe Şemo, 1935'te otobiyoğrafîk romanı Şivanê *Kurmanca*'yı yazar. Yazar eserde çocukluk ve gençlik anılarını anlatmış, ailesinin kendi doğumundan önceki yaşam serüvenine de kısaca değinmiştir. Yazar, 1958'de *Berbang* adında otobiyoğrafîk bir roman daha yayınladı. Ancak bu roman, tam anlamıyla yeni bir eser değildir. Zira romanda anlatılan zaman, Şivanê *Kurmanca*'da anlatılan zamanla aynıdır, bununla birlikte yazar bazı yerlerde anlatıma müdahale etmiştir. Bu makalede Erebe Şemo'nun yaşam öyküsünü anlatmayı neden istediği, daha da önemlisi anlatılan yaşam öyküsünü -anlatılan zamanın sınırlarını genişletmeden- bir kez daha anlatmayı neden gerekli gördüğü incelenmiştir. Ayrıca yazarın yaşamının ne kadarını anlattığı, ne kadarını anlatmadığı ve neden anlatmadığı irdelenmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Erebe Şemo, otobiyoğrafî, müdahale, Şivanê *Kurmanca*, *Berbang*.

## The Narration of a Life Story: A Life and Two Autobiographical Novels

### Abstract

In the period when Erebe Şemo (1897-1978) lived, great events and developments took place in the world, and fundamental changes were experienced. In addition to being a witness, Şemo played an active role in many events of his time. The author's personal life journey, the historical, economic, cultural, ethnic, socio-political conditions of the regions where he lived necessitated the transfer of the author's memoir to future generations. Erebe Şemo wrote his autobiographical work Şivanê *Kurmanca* in 1935. In the work, he narrated about his childhood and youth memories and briefly mentioned the life of his family before his birth. The author publishes another autobiographical work called *Berbang* in 1958. However, this work is not entirely new. Because the narrated time in the work is the same as the narrated time at the Şivanê *Kurmanca*, however, the author got involved in the narration in some places. In this article, it has been examined why Erebe Şemo wanted to tell his autobiography, and more importantly, why he thought it necessary to tell his autobiography once again -without expanding the time limits. In addition, it was stated how much of his life he told, how much he did not tell and why he did not tell.

**Keywords:** Erebe Şemo, autobiography, intervention, Şivanê *Kurmanca*, *Berbang*.

## DESTPÊK

Otobiyoğrafî li gor pênaseya Lejeune, “pexşana retrospektîf e ku ji aliyê kesekî/e rasteqîne ve derbarê hebûna wî/ê da hatiye nivîsîn”<sup>1</sup> ku tê da bala xwe dide ser jiyane û kesayetiya xwe. Wekî Weintraub destnîşan kiriye di otobiyoğrafîyê da serborî bihûrgilî bi hev ve tèn girêdan û serwestbûnekê ava dikin. Di otobiyoğrafîyê da otobiyoğraf dikare peywîrên wek xweravekirin, xwekeşîfîkirin, xweronîkirin, xweavakirin, xwepêşkêşîkirin, xwemafdarkirinê bîne cih<sup>2</sup>. Ew dikare van peywîran û ji wan zêdetir yên wek xweparêzî, xwetehîlîfîkirin, xwenepenîkirinê û hwd. bîne cih yan ji wan bi tenê çendan bîne cih. Ya rastî, nêrîna navxweyî, xwetehîlîfîkirinê psîkolojîk, xwekeşîfîkirina hundirîn, vegêrana rastiyan di derbarê xwe da di otobiyoğrafîya kêmanîskaran da tê tîdin.

Teorîsyenê fransîz Philippe Lejeune di xebata xwe ya bi navê “*The Autobiographical Pact*” (*Peymana Otobiyoğrafîk*) da çar hêmanên pêwîst bo otobiyoğrafîyê destnîşan kirine: **1) Şêweya zimên:** (a) vegêran, (b) pexşan; **2) Mijar:** jiyana şexsî, çîrok/dîroka şexsî; **3) Rewşa Nivîskarî:** nivîskar (kesê rasteqîne) û vegêr wekhev e; **4) Pozîsyona vegêrî:** (a) vegêr û serleheng wekhev e, (b) vegêran retrospektîf e<sup>3</sup>. Li gor wî berhemên xwedî van taybetmendiyên otobiyoğrafîk in; yên li derveyî vê pênaseyê dikarin di kategoriyên wek biyoğrafî, bîranîn, romana şexsî, helbesta otobiyoğrafîk, nivîsên ceribandî, portre, rojname-rojnivîs da bîne hesabandin<sup>4</sup>. Herçiqas Lejeune sînoren mitleq di navbera otobiyoğrafî û cureyên behskirî da xêz kiribe jî, di berhemên otobiyoğrafîk da pir caran ev cure di nav hev da ne. Mesela veqetandîneke mitleq a bîranîn û otobiyoğrafîyê heta çî radeyê mimkûn e? Ji aliyê din ve Lejeune wek şerteke berhemên otobiyoğrafîk bi taybetî yekbûna nasnavê nivîskar, vegêr û serlehengî/ê dupat dike. Lêbelê ligel berbelaviya berhemên otobiyoğrafîk ên bi vegêrê kesê yekem, yên bi vegêrê kesê sêyem jî hene. Di yên bi vegêrê kesê yekem da nasnava nivîskêr, vegêr û serlehengî/ê hevyek e; di yên bi vegêrê kesê sêyem da nasnava her sêyan dibe ku ji hev cuda be yan ya nivîskar û vegêr yek be, ya serlehengî cuda be. Di otobiyoğrafîyên bi vegêrê kesê sêyem da nivîskar, bi giştî tecrubeya xwe ya jiyane, hest û ramanên xwe, cihanbîniya xwe li lehengekî romanê –piranî li serlehengî/ê- bar dike<sup>5</sup>. Dikare bê gotin di çarçoveya hevyekbûna nasnava nivîskar û serlehengî da *peymanî otobiyoğrafîyê* bêtir ji bo tégihîştina tradîsyonel a otobiyoğrafîyê muteber e. Tevî vê bi giştî di otobiyoğrafîyê da nivîskar bixwe vegêr e û di heman demê da wek leheng di nava vegêranê da ye.

Aliyên cuda yên otobiyoğrafîyê hene wek aliyê edebî, psîkolojî, dîrokî û hwd. Di ber vegêrana jiyannameya xwe da nivîskar wek şahidekî/e dîrokê wêneyê serdema xwe jî digire. Mirov dikare ruhê serdema nivîskarî/ê ji otobiyoğrafîya wî/ê bi dest bixe. Di vê çarçoveyê da li gor Weintraub otobiyoğrafî cureyê dîrokî ye û bikerê/a otobiyoğrafîk bi tenê bi dîmenê dîrokî giring e. Her du qad jî merheleyên giring ên rabirdûyê şîrove dikin, rûdanên herî giring ên rabirdûyê dinirxînin, aliyên nenas/nediyar li gor giringiya wan watedar dikin<sup>6</sup>.

Otobiyoğrafî li ser bingeha kiriyara bîranînê pêk tê. Herçiqas di nivîsîna otobiyoğrafîyê da rojnivîs, name, agahiyên ji ferdên malbatê yan ji kesên nas wergirtî bibin malzeme jî malzemeya sereke bîranînê nivîskarî/ê ne. Nivîskar ji pêgeha “îro”ya xwe li rabirdûya xwe dinêre, bîra xwe vedikole û li ser tiştên di bîra xwe da jiyana xwe ya borî dinirxîne. Nivîskarê/a bîrbîr û zana, bi cihanbînî û zanatiya xwe ya niha bermayiyên rabirdûyê yên di bîra xwe da dinirxîne û bi wate dike. Wekî Zweig jî dibêje ji ber pênebawerî û xapînokîya hafîzeyê di otobiyoğrafîya yekî/ê da lêgerîna rastiya mitleq bêwate ye<sup>7</sup>. Tiştên jîbîrkirî û valahiyên hafîzeyê ji aliyê nivîskêr ve tèn dagirtin. Ji aliyê din ve otobiyoğrafî çawa ku qada xwenîşandayîna nivîskarî/ê ye, herweha dibe ku bibe qada xweveşartina wî/ê jî<sup>8</sup>. Nivîskar digel vegêrana rastiye, vegêrana rabirdûya xwe, dikare hin alî û rûdanên giring ên jiyana xwe bi zanatî venegêre, wan nepen bihêle, rastiye venegêre yan jî wê beravajî bike. Venegêrana hin aliyên jiyana şexsî, veşartina raz û nepeniyên dikare bi hesta hetîketiyê, bi dozîna xweparêzî û xweveşartinê bê şîrovekirin<sup>9</sup>. Lêbelê di rewşên ciyawaz da venegêran yan veguherandina rastiyan û hin alî û rûdanên borî dikare bi sedemên cuda yên wek îdeolojîk û polîtîk bîne nirxandin.

1 Philippe Lejeune, *On Autobiography*, (Ed. Paul John Eakin, Trans. Katherine Leary), (Minneapolis: University of Minnesota Press, 1989), r. 4.

2 Christine Allison, “Otobiyoğrafî, serborî û romana kurdî: ‘Erebe Şemo û peywîrên wî’”, *Wêje û Rexne*, 2, (2014), r. 134.

3 Philippe Lejeune, *On Autobiography*, r. 4.

4 Gülşen Topçu, *Çağdaş Arap Edebiyatında Otobiyoğrafî*, (İstanbul: İstanbul Üniversitesi. Yüksek Lisans Tezi, 2019), r. 7-8; Yonca Denizarslanı Bilginer, *Kendiliğin Anlatıları: Çağdaş Amerikan Edebiyatında Otobiyoğrafî*, (İzmir: Ege Üniversitesi. Doktora Tezi, 2010), r. 37.

5 Nurullah Çetin, *Roman Çözümleme Yöntemi*, (Ankara: Öncü Kitap, 2005), r. 234.

6 Yonca Denizarslanı Bilginer, *Kendiliğin Anlatıları: Çağdaş Amerikan Edebiyatında Otobiyoğrafî*, r. 37.

7 Stefan Zweig, *Kendi Hayatının Şiirini Yazanlar*, (İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 2004), r. 17.

8 Mehmet Narlı, “Otobiyoğrafî ve Roman / Otobiyoğrafîk Roman – Her Roman Otobiyoğrafîktir-Otobiyoğrafîk Olan Roman Yoktur”, *Turkish Studies International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, 4, (2009), r. 903.

9 Stefan Zweig, *Kendi Hayatının Şiirini Yazanlar*, (İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 2004), r. 14-15.

Di vê xebatê da du romanên Erebe Şemoyî –Şivanê *Kurmanca*<sup>10</sup> û *Berbang*<sup>11</sup>- tînen vekolan ku du berhemên otobiyoğrafîk in. Bi rêbazê berawirdî û bi xwendineke nêz û bihûrgilî tînen nirxandin ka nivîskarî çima pêwîst dîtiye jiyannameya xwe binivîsîne. Herweha tînen nirxandin û şîrovekirin ka çima romana xwe ya duyem a otobiyoğrafîk nivîsandiye bêyî ku sînorên dema vegêranê biguherîne û guherîneke mezin di naverokê da bike. Herweha bi berawirdkirina her du berhemên nivîskarî û zanyariyên derbarê jiyana wî da tînen vekolan ka wî çiqasî jiyana xwe vegêraye û çiqasî venegêraye. Herweha tînen şîrovekirin û nirxandin ka çima hin rûdanên giring ên jiyana xwe venegêrane.<sup>12</sup>

Berî nirxandinê ji ber ku Şivanê *Kurmanca* û *Berbang*, romanên otobiyoğrafîk in pêwîst e em çend tiştan derbarê pêwendiya otobiyoğrafî û romana otobiyoğrafîk da bibêjin. Wekî ji zanyariyên jorîn jî diyar e otobiyoğrafî ew berhem e ku kesekî/e, yekser li ser jiyana xwe nivîsandiye. Otobiyoğrafî li ser bîranînan tînen nivîsîn, lê ne ku bi awayekî lêrasthatinî. Ew bîranîn di nava formekê da tînen birêkûpêkkirin. Li aliyê din romana otobiyoğrafîk, vegêraneke fiksiyonel e ku leheng, rûdan û fikrên wê yekser tînkildarî nivîskarê/a wê ne<sup>13</sup>. Di romana otobiyoğrafîk da rasteqîniya cîhana derve û rasteqîniya fiksiyonel hevgerîdayî ne. Cudahiya herî berbiçav a romana otobiyoğrafîk ew e ku nivîskarî/ê jiyannameya xwe wek roman bi nav kiriye. Herweha taybetmendiya “fiksiyon”ê ferqeke diyar e di navbera her du cureyan da. Lêbelê ev nayê wê wateyê ku otobiyoğrafî, bi temamî objektîf û realîst e. Otobiyoğrafî jî dawîya dawîn berhemeke însakirî ye, li ser bingeha bîranînan birêkûpêkkirina rabirdûyê ye ku ev wê nêzikî fiksiyonê dîke<sup>14</sup>. Dagirtina valahiyên hafizyê, venegêrana hin rûdan û bîranînan, yanî vegêrana rûdan û bîranînen bijarte û birêkûpêkkirina vegêrana wan di nava vegêranê da aliyê fiksiyonel/edebî yê otobiyoğrafîyê berçav dîke. Lewma dijwar e ku meriv sînorên mitelq tîxe navbera her du cureyan. Li ser vê bingehe eger di berhemeke fiktîf da nivîskarek ji jiyana û serboriya xwe behs bike ew berhem dikare wek berhemeke otobiyoğrafîk bê qebûlkirin û nirxandin. Romana Erebe Şemoyî, Şivanê *Kurmanca* –û bi awayekî neyekser *Berbang*- jî ji ber ku derbarê jiyana û serboriya nivîskarî da ne wek berhemên otobiyoğrafîk tînen qebûlkirin<sup>15</sup>. Heta hin vekolar destnîşan dikin ku Şivanê *Kurmanca* ji romanê bêtîr berhemeke otobiyoğrafîk e<sup>16</sup>. Jixwe nivîskar bixwe jî behs dîke ku Şivanê *Kurmanca* li ser jiyana wî ye<sup>17</sup>. Lê ev nayê

10 Erebe Şemo, Şivanê *Kurmanca*, (Tîpguhastin. Mustafa Aydoğan), (Diyarbakır: Lîs, 2009).

11 Erebe Şemo, *Berbang*, (Trans. Rêber Dilşêr), (Stockholm: Kurdistan, 1988)

12 Derbarê nivîskarên damezrîner û giring ên edebiyata zimanên din da bi sedan xebatên akademîk, gotar û pirtûk hatine nivîsîn û hin jî tînen nivîsîn. Şexsiyetên wiha û berhemên wan ji aliyên cuda ve hatine nirxandin û şîrovekirin û hin jî derbarê wan da lêkolînen akademîk tînen kirin û weşandin. Dema em berê xwe didin warê kurdî dibînin di lîteraturê da li ser nivîskarê romana ewil a kurdî -yanî destpêker û damezrînerê romana kurdî- Erebe Şemoyî da bi tenê çend xebat hene. Eşkere ye xebatên heyî hem ji aliyê hejmar û hem ji aliyê naverokê ve ne bes in. Ji aliyê din ve xebatên heyî jî bi piranî li ser romana ewil a nivîskarî -herweha ya kurdî- Şivanê *Kurmanca* rawestine û di ber ra bi kurtî hevşibîna wê û *Berbang*ê nirxandine. Nivîsa Mustafa Aydoğan a bi navê “Destpêka Romana Kurdî: Şivanê Kurmanca” û gotara Christine Allison a bi navê “Otobiyoğrafî, Serborî û Romana Kurdî: Erebe Şemo û peyrewên wî” du xebatên giring in derbarê Şivanê *Kurmanca* da. vekolera di xebatên behskirî da girêdana her du romanên otobiyoğrafîk ên nivîskarî jî vekolane. Aydoğan di çar rûpelên nivîsîna xwe da bal kişandiye ser girêdan û şibandina her du berheman, guherînen di *Berbang*ê da bi guherînen demê yê zimanî, civakî û siyasî şîrove kirine. vekolêrî bêtîr taybetmendiyên şeklî yê wê wek lêzedekirin, kêmkirin an veguherîna nav, beş, paragraf û hwd. destnîşan kirine, mînak dupatkirina şêxîtiya bavê Erebe Şemoyî û lêzedekirina beşa *Nama ji Amerîkayê* di *Berbang*ê da wek mînakên guherîna û tesîra civakî nirxandine. Lê ji bo veguherînen siyasî yê di navbera her du berheman da mînak nedane. Li aliyê din Allisonê jî di rûpel û nîvekê da girêdana her du berheman vekolayê û *Berbang* wek venivîseke Şivanê *Kurmanca* qebûl kiriye. Tevî ku vekolêr mînakê ji bo veguherîna siyasî di navbera her du berheman da daye, îdia kiriye ku guherînen pêvajoya siyasî ji bo venivîsîna Şivanê *Kurmanca*, yanî *Berbang*ê ne sedemek e. Nivîsîna *Berbang*ê bi tenê girêdayî sedemên wêjeyî nirxandiye. Di vê xebatê da berevajî wê îdiayê em îdia dikin û bi gelek mînanan berceste dikin ku *Berbang* esasen ji ber sedemên siyasî hatiye nivîsîn û sedemên edebî talî ne. Yanî piştî biryara nivîskarî ya ji bo venivîsînê, ew jixweber derketine holê ji ber ku ji nivîsîna Şivanê *Kurmanca* ta biryara nivîskarî di warê zimên da gelek guherîna pêk hatine. Herweha bivînevê feraseta edebî ya nivîskarî jî di vê navberê da bêtîr kemiliye. Bi mînakên berawirdî me hewil daye guherînen zimên û teknîka vegêranê jî destnîşan bikin di versiyona dawîn da. Ji ber vê ev xebat bi giştî xebateke berawirdî ye di navbera du versiyonên vegêra jiyannameya nivîskarî da û bi mînanan sedemên nivîsîna *Berbang*ê hatiye bercestekirin. Herweha ferqeke din a vê xebatê jî yê berî xwe, lêpîrsîna sedemên nivîskarî ye bo nivîsîna otobiyoğrafîyê. Bi gotîneke din bi tenê nehatiye vekolan ka nivîskarî çima cara duduyan heman otobiyoğrafî nivîsandiye di heman demê da hatiye lêpîrsîn nivîskarî çima pêwîst dîtiye Şivanê *Kurmanca* di şeklê romaneke otobiyoğrafîk da binivîse. Herî dawîn ji xebatên heyî cudatîr divê xebatê da her du romanên nivîskarî yê otobiyoğrafîk û zanyariyên biyoğrafîk ên derbarê nivîskarî da hatine berawirdkirin û hatiye destnîşankirin ka nivîskarî çiqasî jiyana xwe vegêraye, çiqasî venegêraye. Hatiye lêpîrsîn û şîrovekirin nivîskarî bi taybetî çima hin rûdanên giring ên jiyana xwe –yê di navbera dema vegêrî ya di her du berheman da û herweha yê heta dema nivîsînê- venegêrane.

13 Mehmet Narlı, “Otobiyoğrafî ve Roman / Otobiyoğrafîk Roman – Her Roman Otobiyoğrafîktir-Otobiyoğrafîk Olan Roman Yoktur”, r. 902.

14 Bnr. Fatih Sakallı, “Burhan Günel’in Romanlarında Otobiyoğrafîk Benlikler”, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 9/43, (2016), r. 420-422.

15 Bnr. Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovêtê*, (İstanbul: Deng, 2012); Remezan Alan, *Bendname li ser Rûhê Edebiyatekê*, (İstanbul: Avesta, 2009); Christine Allison, “Otobiyoğrafî, serborî û romana kurdî: ‘Erebe Şemo û peyrewên wî’”; Cihan Turan, “Di Navbeyna Dîrok û Edebiyatê da: Teknîka Biyoğrafî û Otobiyoğrafîyê di Romanên Erebe Şemo Berbang û Şivanê Kurmanca de”, *Destpêka Romana Kurdî – Gotarên li ser Romana Êwra Kavkazê*, M. Zahir Ertekin - Mehmet Yıldırımçakar (Ed.), (Van: Peywend, 2020); Yılmaz, *Dasa Şemo û Çakûça Gorkî Xwendineke Berawirdkî li dor Şivanê Kurmanca û Sêbareya Gorkî*, (Wan: Peywend, 2021).

16 Christine Allison, “Otobiyoğrafî, serborî û romana kurdî: ‘Erebe Şemo û peyrewên wî’”, r. 139.

17 Bavê Nazê, “Hevpeyvîna bi Erebe Şemo re ya Berî 25 Salan”, *Kovara W*, 15, (2007), r. 32.

wê wateyê ku berhem bi temamî wek vegêrana rasteqîne bê hesabandin û aliyê wê yê fiktîf bê paşguhkirin. Ji ber vê yekê dema aliyê wê yê otobiyoğrafîk bê nirxandin pêwîst e vekoler wek rêbaz zanyariyên biyoğrafîk ên derbarê nivîskarî da jî bigirin ber çavan.

## 1. Du Romanên Otobiyoğrafîk û Heman Periyoda Jiyannameyekê

Li gor Stefan Zweig sedema nivîsîna otobiyoğrafîyê bi arezûya xwenemirkinê ra têkildar e ku wek dozîneke sereke di her mirovî da bi awayekî heye. Xwesteka xwenemirkinê dike ku mirov bixwaze şopekê li pey xwe bihêle û pê her zindî bimîne. Otobiyoğrafî, awayekî xwesteka îsbatkirina jiyane ye ku rabirdûya wê digihîje heta îşaretên li ser qalikên daran û kêlikan. Ev deravêtîyên dozîna xwe-vegêranê, hiştina şopekê li pey xwe, ragihandina hebûn û jiyana xwe ye bo nîfşên bê. Sedema bingehîn a otobiyoğrafîyê, vîyanekê derhişîn e bo ebedîkirina xwe. Bi sedsalan şûn da ku mirov bêtir bîrbir û zana dibe, sedemeke din li wê dozîna xwerû zêde dibe: nêrîna navxweyî/hundirîn. Xwesteka xwe-zanîn, xwe-nasîn, şîrovekirinê, keşfkirina “Ez” a xwe dibe sedemek bo nivîsîna otobiyoğrafîyê ku dilrastî (samîmîyet) û wêrekiyê ferz dike li ser otobiyoğrafî.<sup>18</sup> Fîlologê Alman George Misch bal kişandîye ser aliyên dîrokî û psîkolojîk ên otobiyoğrafîyê. Li gor wî kesên nimûneyî bikerên rewşa ne bo otobiyoğrafîyê ku di rûdanên dîrokî yên giring da rol girtine, bi serfirazîyên xwe di nava gel da navdar bûne. Ji vî alî ve otobiyoğrafî wesfekî belgeyî digire ku taybetmendîya dîdaktîk/perwerdekirinê derdixe pêş.<sup>19</sup>

Li ber ronahiya van agahiyan dikare bê gotin Erebe Şemoyî romana xwe ya otobiyoğrafîk, Şivanê *Kurmanca*, bi dozîneya xwe-nemirkinê nivîsandiye. Wî xwestîye şopekê li pey xwe bihêle bo îsbata jiyane û serboriya xwe wekî şahidê demeke giring a dîrokî. Xwestîye serboriya xwe ya zarokatî û pêş-xortaniyê, bîranînên xwe yên şoreşgêriyê, serkeftinên xwe, ligel jiyana hejar û belangaz jêhatîbûna xwe, newekheviya civakê, pê ra guherîn û veguherînên dîrokî, polîtîk û civakî yên lê bûye şahid û bi awayekî aktîf tê da rol dîtiye û hwd. li derekê qeyd bike ku tu caran neyên jîbîrkirin. Ji ber xuyanga dîrokî û îdeolojîk a otobiyoğrafîya Şemoyî, dikare bê gotin sedemeke nivîsîna wê jî sedemên îdeolojîk in. Şemoyî serboriya xwe bi nêrîna *realîzma sosyalîst* nivîsandiye, ji ber vê jî aliyên şexsî bêtir cext li ser aliyên civakî û îdeolojîk ên jiyana xwe daniye. Dikare bê gotin tevî dozîna xwenemirkinê û jê bêtir Şemoyî bi sedemên îdeolojîk jiyannameya xwe nivîsandiye. Bi dayîna serboriya tekane, yekta û bêhempa ya lehengekî îdeal û nimûneyî yê rastîqîne û rêbazên berawirdkirinê xwestîye xwîner perwerde û meylidar bike. Berhem di rengekî dîdaktîk da ye, bi berawirdkirin û dijraberiya jiyana berê û sosyalîzmê tê armanckirin di xwîner da hişmendîyeke îdeolojîk çêbe. Nivîskarî bi mînakê serboriya jiyana xwe lehengekî îdeal berpêş kiriye ku di destnîşankirina tecrubeyên wî da, meyleke perwerdekirina xwîner tê xuyakirin.<sup>20</sup> Li aliyê din nikare bê gotin ku nêrîna navxweyî, keşfkirina “Ez” a xwe, tehlîlên hundirîn bo Şemoyî sedemeke nivîsandina serboriya jiyane ye. Lewre em di Şivanê *Kurmanca* da rastî nîşaneyên xwe-keşfkirinê, tehlîlên hundirîn, nêrîna navxweyî nayên, beravajî em dikarin bibêjin “Ez” di nav xuyanga îdeolojîk û dîrokî da hatiye veşartin, hest û ramanên “Ez” êtiyê, şîrove û tehlîlên psîkolojîk hema hema nînin. Digel ku Şivanê *Kurmanca* romanekê otobiyoğrafîk e “Ez” di paş perdeya îdeolojîk, dîrokî û civakî da maye, wêneyekî zelal a “Ez”ê nayê bidestxistin, wêneyekî ximamî, nediyar çêdibe di mêjîyê xwîner da. Berçav e ku Şemoyî jiyannameya xwe bi dozîna nemirkinê jiyana xwe, dema xwe nivîsandiye û xwestîye wek şahid û aktorekî demeke giring a dîrokî şopekê li pey xwe bihêle, di şexsiyeta xwe da rol-modelekî pêşkêş bike. Dibe ku îfadeyên wek mayîna “Ez”ê li paş perdeya îdeolojîk, dîrokî û civakî da û xwesteka wî ya xwe-nemirkinê wek du angaşten nakok bîna famkirin. Lê divê bê zanîn Şemoyî wê serboriya şexsiyeta jiyana xwe vedigêre ku bi saya nîmet û derfetên Sovyetê dibe çîroka yekî xweafirandî. Bi gotîneke din divê şexsiyeta wî wek “Ez”ê takekesî neyê famkirin. Ew wek şexsiyeteke îdeolojîk bûye aktor û şahidê dema xwe û jiyane û serboriya xwe jî ji wê riwangehê vedigêre. Dixwaze xwe û serboriya xwe, bi wêneyê dîrok û civaka tê da jiyaye, nemir bike. Lewma aliyê dîrokî di berhemên jiyannameya wî da gelek li pêş e ku ew dikarin wek belgeyên dîrokî jî bîna xwendin.

Sedema nivîsandina Şivanê *Kurmanca* wek berhemeke otobiyoğrafîk, kêma zêde dikare di çarçoveya şîroveyên jorîn da bê nirxandin. Lêbelê berhema Şemoyî ya bi navê *Berbangê* pîrseke din li me ferz dike: Erebe Şemoyî çima pêwîst dîtiye berhemeke din di rengê romana otobiyoğrafîk da binivîsîne? Eger *Berbangê*, berdewama Şivanê *Kurmanca* bûya, yanî eger ji cih û dema Şivanê *Kurmanca* bidawîbûyî dest pê bikira û behsa rûdan û lehengên nû bikira hingê bersiv eşkere bû. Jixwe sedema nivîsandina *Berbangê* dê bi sedema nivîsandina Şivanê *Kurmanca* ra yek bûya, lê sedemeke nû dê lê bihata zêdekirin: Xwesteka nivîskar bo yekparekirina jiyannameya xwe, nehiştina valahiyan di zincîreya jiyannameya xwe da. Lêbelê em nikarin vê şîroveyê bo sedema nivîsandina *Berbangê* bikin. Lewre *Berbangê*, ne berga duyem a Şivanê *Kurmanca* ye; ew venivîsandina Şivanê *Kurmanca* ye. Ligel hin kêmkirin, zêdekirin

18 Stefan Zweig, *Kendi Hayatının Şiirini Yazanlar*, r. 13-14.

19 Yonca Denizarslanı Bilginer, *Kendiliğin Anlatıları: Çağdaş Amerikan Edebiyatında Otobiyoğrafî*, r. 35-36.

20 Bnr. Zülküf Ergün, *Edebiyata Kurdî ya Sovyetê*, (İstanbul: Nûbihar, 2023), r. 31-55.

û guherînan versiyoneke dîtir, versiyoneke revîzekirî ya Şivanê *Kurmanca* ye.<sup>21</sup> Her du berhem, bi behskirineke kurt ji demeke berî xwedêdana Şemoyî dest pê dikin û bi xebata Şemoyî ya di nava kurdên Yekîtiya Sovyetê bi dawî dibe. Yanî sînoren demê di her duyan da wek hev e û naveroka wan jî bi giştî wek hev e. Ku wisa ye, nivîskarî çima pêwîst dîtîye ku jiyannameya nivîsandî, Şivanê *Kurmanca*, ji nû ve binivîsîne? Helbet tu kes dê tu caran sedema misoger a biryara nivîskarî nizanibe. Lê ji xwendin û berawirdkirina her du jiyannameyan hin îşaret dihêlin ku em hin şîroveyan bikin ka Erebe Şemoyî heman jiyanname çima du caran nivîsandiye? Ev îşaret, bi xwendineke nêzîk û bihûrgilî di sererastkirin, veguherandin, destwerdanên nivîskarî da tînen xuyakirin.

## 1.1. Sedemên Edebî yê venivîsandina Otobiyoğrafîya Erebe Şemoyî û Destwerdanên Edebî di Berbangê da

Li gor hinekan Erebe Şemoyî ji ber sedemên edebî *Berbang* wek guhertoya dawîn a Şivanê *Kurmanca* nivîsandiye ne ji ber sedemên siyasî.<sup>22</sup> Ev angaş, dikare bi mînakên destwerdanên di vegêranê da bê xurtkirin, piştraskirin û peyitandin. Şemoyî pêwîst dîtîye di *Berbangê* da li hinek cihan bihûrgilî vêbeje, derfetên îfadekirinê berfireh bike, gramer û vegêranê sererast bike, agahiyên pêwîst lê zêde bike, valahiyên vegêranê dagire, pêwendiyên mentiqî û wateyî yê vegêranê xurt bike; pêwîst dîtîye li hin cihan agahî û hûrgiliyên nepêwîst jê bibe; di tevahiya vegêranê da xwestiye serdestiya vegêr sist bike û vegêrana lehengan bêtir berbiçav bike. Bi van destwerdanan xwestiye vegêranê zelaltir, fambartir, xurttir û dewlemendtir bike. Bo nimûne dema Şemoyî di artêşa rûsan da dîlbendiyê dike, bi artêşê ra di berwarê çiyayekî ra diçin. Şemoyî, di Şivanê *Kurmanca* da çavdêriyên xwe di jêgirtina ewil da wiha teswîr kirine:

(1) Kulîlka devê jê vekiribûn, reng-rengî bûn, li me dinêrin. (2) Bîna wan kulîlka xweş dihat. (3) Hespa cara xwe qûz dikir, devê xwe davîte hêşnaya teze, rind dixwarin. (4) Her derbekêra devê hespa tijî şînayî dibû (Şivanê *Kurmanca*, 139).

(1) Kulîlka jî pence dabûn, cûre-cûre ew best, newal û berwar xemilandibûn, te digot tev li me dinihêrin. (2) Bîna wan kulîlka xweş dihat. (3) Kivş bû, wekî hespê jî kêf dida, çimku carna kûz dibûn, devê xwe davêtine hêşnaya teze, rind diçêriyan. (4) Her derbekêra devê wan tijî hêşnaya xweş dibû (*Berbang*, 77).

Heman dîmen -wekî di jêgirtina duyem da tê dîtin- di *Berbangê* da tevî hin sererastkirinên gramerî, guherînan lêzêdekirina hin hêmanên zimanî bi zimanekî hêrikbar û hunerî, bi teswîreke zelaltir û berfirehtir hatiye xêzkirin. vegêran dewlemendtir û xurttir bûye û di heman demê da perspektîfa vegêranê guheriye, bêtir zindî û berfirehtir bûye. Di nivîsên reşkirî da tê dîtin ku nivîskarî li hin cihan sererastkirinên zimanî, gramerî û lêzêdekirinên edebî kirine. Bo nimûne, lêkera “dinêrin” (dinihêrin) (1), û hokera “cara” (carna) (3) ji aliyê rastnivîsînê ve sererast kiriye. Herweha îfadeyên teswîrê yê wek “cûre-cûre ew best, newal û berwar xemilandibûn, te digot tev li me dinihêrin” li vegêranê hatine zêdekirin. Bi vî awayî wêneyê vegêrayî bêtir hatiye zindîkirin. Di îfadeya “xwe qûz dikir” (carna kûz dibûn) (3) da nivîskarî bêjeya “kûz”ê ji aliyê rastnivîsînê ve sererast kiriye û bi awayekî rast bi lêkera “bûn”ê bi kar aniye. Nivîskarî hin îfade li hinek hevokan zêde kirine bo famdarî û zelalkirina wateyê. Bo nimûne, di hevoka (3)an da “[k] ivş dibû, wekî hespê jî kêf dida, çimku...” li hevokê zêde kiriye ku wek rewşeke encama kûzbûn û çêrandina hespan hatiye destnîşankirin û wateya hevokê xurttir dike. Herweha di heman hevokê da haya nivîskarî ji nûanseke semantîk a di navbera “xwarin” û “çêrandin”ê da bûye û lêker guherandiye. Herwekî din di hevoka (4)an da rengdêra “xweş” li hêşinayê zêde kiriye ku xuyanga kêfa hespan dupat dike. Wekî diyar e mînaka *Berbangê*, ji aliyê zimên û vegêranê ve hatiye sererastkirin. Loma teswîra di *Berbangê* da teswîreke bêtir edebî û serkeftî ye û wêneyê teswîrkirî nisbet mînaka ewil bêtir di mêjiyê xwîner da zindî dibe.

Şemoyî, beşa *Li firqêda* ya Şivanê *Kurmanca* di *Berbangê* da kiriye du beşên bi navên *Di Partiyê (Firqeyê) De* û *Li Gundê Me*. Di van beşan da nivîskar hevnasîna bi fikrên sosyalîst, hevaltiya bi şoreşgêran ra, beşdariya xebatên şoreşgêriyê, endamtiya partiyê û hwd. radigihîne (*Berbang*, 81-98). Ji ber axaftina di mîtinga Yekê Gulanê da Şemo tê girtin. Piştî derketina ji girtîgehê diçe gundê xwe. Di beşa *Li Gundê Me* da bîranînên xwe yê gundên wê demê vedibêje yê derheqê xebatên rêxistinî û hişyarkirina gundiyan da (*Berbang*, 88-98). Di Şivanê *Kurmanca* da nivîskar rûdanên siyasî yê wê demê û rengvedana wan a li ser gundiyan, xebata xwe ya di nav gund û gundiyan da bi gelek agahiyên li pey hev rêz dike û bi giştî ji devê vegêrê kesê yekem vediguhezîne. Herçiqas diyologên lehengan jî veguhezîne vegêr hebûna xwe qet nade jibîrkirin, her di nava diyalogan da jî deng dide. Lêbelê di *Berbangê* da vegêrê kesê yekem, di nava vegêrana xwe da pir caran cih daye vegêranên lehengan jî û bi qasî dirêjîya diyalogên yekser xwe daye kêlekê. Ji ber vê di *Berbangê* da vegêraneke bêtir sade û mîmetîk pêk hatiye. Herweha vegêr di Şivanê *Kurmanca* da bîranînên xwe bi giştî bi teknîka kurtkirinê û veguheztina neyekser vegêrane. Lê di *Berbangê* da

21 Bnr. Christine Allison, “Otobiyoğrafî, serborî û romana kurdî: ‘Erebê Şemo û peywerên wî’”, r. 144.

22 Christine Allison, “Otobiyoğrafî, serborî û romana kurdî: ‘Erebê Şemo û peywerên wî’”, r. 145.

heman bîranîn tevî rave û nirxandinên vegêrî bi diyalogên neyekser hatine sêwîrîn. Bo nimûne, di Şivanê *Kurmanca* da behs kiriye ku Cindiye Êso û Murovê Emo ligel wî dixebitin di nava gundan da, gundiyan hişyar dikin derbarê polîtîkayên Bolşevîkan da ku dê mafê mülkiyetê adilane di navbera gundiyan da belav bikin, newekheviya dewlemendî û xizaniyê ji holê rakin. vegêrî, bi teknîka kurtkirinê behs ji hevalên xwe yên navborî û mahiyeta xebatên xwe kiriye: “Vî gilî da piştî min girt Cindiye Êso û Morovê Emo; Dizîkava ez û Cindiye Êso çûne wan gunda; ... Morovê Emo xebateke rind bir nava wan muxluqatê çend gundada. Min û Morov me, gundî ussa kiribûn...” (r. 152). Lêbelê vegêrî di *Berbangê* da her du hevalên xwe yên navborî teswîr kirine ka mirovên çawa ne û hem taybetmendiyên wan ên fîzîkî hem rewşa wan a aborî ragihandiye. Herweha derbarê hevaltiya xwe da jî hin agahî dane:

Morofê Emo hê cahil bû. Xortekî bi kêfa te bû, lê kesîb bû. Gele cara şev em çolê, serê çiya, ber zînara, me xeber dida derheqa emrê me kurda û yaşamişbûna me (r. 89). ; Raste, Cindî merîkî dewletî bû, lê merîkî zef rind bû, xêrxwaz bû, merîkî çawa em dibên progrêsv (paşverû -W. K.) bû, tevra dixwast pakî, ne ku mînanî hineka, ku digotin tev ji minra, xulam nedigirtin, heft bira bûn, teve xebatçî bûn (r. 90).

Li aliyê din nivîskarî bi rêya diyalogan cîhana wan a zêhnî û ruhî li ber çavên xwîneran raxistiye. Mesela mijara mafê mülkiyetê û newekheviya civakê da di Şivanê *Kurmanca* da bi awayekî ne berçav di nav vegêrana rêzebûyeran da hatiye dayîn. Heman mijar di *Berbangê* da bi awayekî cuda hatiye pêşkêşkirin. Mijara mafê mülkiyetê -ku derbarê parvekirina erdên dewlemendên gund, axa û began li gundiyan e- bi rêya sohbetên Şemoyî û Morofê Emoyî -yên li çolê, yên li ber zînan- hatiye dayîn (r. 89). Di *Berbangê* da raberkirina civînên Şemo, Cindî û Emoyî, sohbetên wan ên li ser heman mijaran, axaftinên wan ên mîmetîk, xwîner bêtir dikişîne nava vegêranê:

Cindî gote min:

-Ereb, tu dibêjî, wekî erd ê meye.

-Erê, -min gotê.

-Û tu dibêjî wî erdî gerekê em ji milkedara bistînin.

-Erê, em gereke ji wan bistînin.

-Lê ka dîwan dide me?

-Emê dîwana xwe jî bibijêrin, dîwanê ji meve.

-Ne eskerê wan heye, Cindî go.

-Eskerê kê? -Min pirsî...

-Eskerê neçelnîka û milkedara, axelera.

-Cindî çima ew esker ne ji meye? Ne ewledê me gundiya û xebatçiya bin sîlihêdanin (r. 90)

Di diyaloga di şeweya pirs û bersivan da helwesta nivîskarî ya îdeolojîk eşkere ye û xwestiye bi vê stratejiya vegêranê bêtir karîgeriyê li xwîner bike. Vê teknîka diyalogê taybetmendiyê bêtir mîmetîk daye vegêranê û bi vî rengî mesafeya xwîner û vegêranê gelek kêmbûye. Karîgeriyê wiha çêdibe ku heçku ew bersiv ji bo pirsên di mêjîyê xwîner da hatibin dayîn. Piştî diyalogê vegêrana nivîskarî ya derbarê dewama sohbetê da aliyê fêrkarî û meyldariyê bêtir derxistiye pêş ku jê armanc agahdarkirina xwîner e derbarê xebat û fikrên Bolşevîkan da:

Min Cindiye Êsora û Morofê Emora gilî kir, çawa esker li bajarê Sarîqamişê giliyê Lênîn digot, diwekiland û daw dikir, wekî dîwanê bidine pala û gundiya.

Min wanra gilî kir, wekî eva giliyana Lênîn xwexwe danîne, berê ev pirs danîbû ber padşê, niha ew gilî Lênîn danîne ber vê dîwana Kêrênskî... (r. 90).

Di Şivanê *Kurmanca* da nivîskar bi giştî gelek rûdan û agahiyan vedigêre, heçku dixwaze her tiştê ku dîtiye, lê bûye şahid yan bihîstiyê di yek derbê da bêtir veguhezîne. Em dibînin di *Berbangê* da jî aliyê teknîka vegêranê ve nivîskar bêtir kemiliye. Wekî di mînakên ji beşên *Li firqêda* (Şivanê *Kurmanca*) û *Di Partiyê (Firqeyê) De û Li Gundê Me (Berbang)* tê dîtin nivîskarî di *Berbangê* bi taybetî hin aliyên bîranînan derxistine pêş û tevî xurtkirina vegêrana vegêr bêtir cih daye vegêrana lehengan û ew bêtir berçav kirine. Bi vî rengî, bi bêtir birêkûpêkkirina agahiyan û sazkirina diyalogan hem riwangeha vegêranê sererast kiriye û hem serdestiya vegêr nisbet berhema ewil sist kiriye.

Bi berawirdkirina hin jêgirtinên din em dixwazin hin veguherînên din destnîşan bikin ku destwerdanên nivîskarî yên edebî berceste bibin: Şivanê *Kurmanca*:

...(1) ez qîza meta min, Karê hînî hev bûn. (2) Em cara diçûne çolê, malê cînara û gelle cîya em hevra digerîyan.

(3) Em ussa hînî hev bûn, -dilê me kete hevdu (r. 126).

*Berbang*:

...(1) ez û qîza meta min Karê hînî hev bûn, **dilê me kete hevdu**. (2) Em **carna** diçûne çolê, **diçûne** malê cînara û **gele ciya**, **em ji hev nediqetiyân**, **hevra diçûn**. (3) Em usa hînî hev bûn, **usa dilê me kete hevdu**, **wekî niv sehetê me hevdû nedîta**, **bîna me dervediket** (r. 67).

Wekî tê dîtin tevî sererastkirina forma hin bêjeyan (**cara/carna**, **gelle ciya/gele ciya**), xalbendiyê, guherîna cihê hin hevokan (**dilê me kete hevdu**), di (3)an da hevokeke nû li vegêrana bîranînê hatiye zêdekirin ku çawaniya evîna dildaran û girêdana wan baştir derdixe pêş. Hevoka (**em ji hev nediqetiyân**) a li (2)an zêdekirî jî bi vî rengî ye. Li vir bi lêzedekirina van hûrgiliyan pêwendiyên wate û mentiqî jî hatine dagirtin. Lewra di *Berbangê* da bi vegêrana asta evîna xwe nivîskarî hem hestên xwe yên evînê watedar kirine û hem jî sedema manewî destnîşan kiriye bo qelendayîn û rûdanên dûre diqeminin.

Di Şivanê *Kurmanca* da nivîskar gelek bîranîn û rûdanan li pey hev vedigêrî pir caran bêyî ku girêdanekê di navbera wan da çêbibe. Em dibînin nivîskarî di *Berbangê* da qismen bala xwe daye girêdanên bi vî rengî. Bo nimûne demekê Erebe Şemo di şerê Rûsan û Romê da di artêşa rûsan da dîlbendiyê dike. Şemo ji ber ku ne leşker e dikare destûra xwe bixwaze û here gundê xwe. Di Şivanê *Kurmanca* da nivîskarî diyar nekiriye ka çima di eniya şerî da wî wek leşker naxin nava şerî. Lê di *Berbangê* da wek bo sedema wê, agahiyeke pêwîst daye: "...çimku padşê ûris em kurd nedibirine şêr..." (r. 78).

Dikare bê gotin nisbet Şivanê *Kurmanca*, *Berbang* ji aliyê teswîrên edebî ve jî dewlemendtir e. Bo nimûne, di *Berbangê* da nivîskarî di serboriyên xwe yên li zozanan û vegera zozanan da jiyan, xwarin, xebat, karbeşî, cil û berg, reqş û awaz, awayê evîn û bengîtîyê, edet, rabûn û runîştina kurdan bi teswîrên bihurgilî vêgarene. Nivîskarî di şûna vegêrana rêzebûyeran da bi teswîran dîmenekî rengareng û berfireh raxistiye ber çavê xwîner. Herweha gotinên kila-man jî veguheztine ku vegêran ji aliyê cureyên edebî ve dewlemend kirine (r. 46-55).

## 1.2. Sedemên Polîtîk ên venivîsandina Otobiyografiya Erebe Şemoyî û Destwerdanên Siyasî di *Berbangê* da

Mînakên destwerdanên edebî û teknîkî, gelek in di *Berbangê* da ku dibin delîlên guncaw bo piştrastkirina angaştaya venivîsandina otobiyografiya Şemoyî bi sedemên edebî. Lêbelê bi ya me sedema bingeşîn a venivîsandina Şivanê *Kurmanca*, yanî weşandina *Berbangê* bêtir ji ber sedemên polîtîk in. Wekî tê zanîn Erebe Şemo, di 1937an da tê girtin û sirgûnî Sibîryayê tê kirin, piştî nozdeh salan, di 1956an da azad dibe û vedigere.<sup>23</sup> Piştî vegeerê, wek ku qet belasebeb nehatibe cezakirin ji berê bêtir li xebatê sor dibe û piraniya xebatên xwe hingê dinivîse. Dû vegera ji sirgûnê karê ewil ê Şemoyî, revîzekirin û sererastkirina Şivanê *Kurmanca*, yanî nivîsîn û weşandina *Berbangê* ye. Li vir pirseke pêwîst derdikeve holê: Çima Şemoyî piştî azadbûna xwe berî her tiştî demildest di rengê romaneke nû da otobiyografiya xwe ji nû ve nivîsandiyê? Ji bo fikirdanekê divê mirov bala xwe bide sedema sirgûnkirina nivîskarî. Hin rewşenbîrên kurd –yek ji wan Şemo ye- bi angaştaya "sixurên Rojava", bi rêya edebiyatê "propagandaya antî-sovyetê" tînan tawanbarkirin û tînan girtin yan jî sirgûnkirin.<sup>24</sup> Gelo wergêranên Şivanê *Kurmanca* yên bo zimanên din<sup>25</sup>, bi taybetî yên bo almanî û fransî, dibe ku di dadgehê da bo piştrastkirina tawanbariyên navborî û sirgûnkirina Şemoyî wek delîl hatibin qebûlkirin. Ya rastî ihtîmaleke ne dûrî atmosfer û konjektûra wê demê ye. Jixwe revîzyon, sererastkirin, destwerdanên di Şivanê *Kurmanca* da û wek *Berbang* çapkirina wê piştî vegera ji sirgûnê, me dibe wî fikrî ku *Berbang* ji aliyekî ve dikare wek pêşkêşiya xwe-parêziyê jî bê nirxandin. Bi danberhevdaneke bihurgilî ya Şivanê *Kurmanca* û *Berbangê* diyar dibe ku Şemoyî heçku xwestiyê jiyan, şoreşgêrî û fikrên xwe erê bike di çavê hinekan da. Aliyê xweparêziya "ez"etiyê ya otobiyografiyê di *Berbangê* da bi eşkereyî tê dîtin.

Ji aliyê din ve armanca Şemoyî bo venivîsandina romana xwe ya otobiyografîk, bi tenê edebî bûya wî dikaribû Şivanê *Kurmanca* di ber çavan ra derbas bikira, ji aliyê zimên û teknîkên vegêranê ve ew sererast bikira û bêyî guherandina navî ew wek versiyoneke revîzekirî û sererastkirî bida weşandin. Jixwe otobiyografiya Şemoyî bi navê Şivanê *Kurmanca* têra xwe hatibû nasîn, ji aliyê Maksîm Gorkî<sup>26</sup> ve hatibû pesinandin û li zimanên din hatibû wer-

23 Eskerê Boyîk, Çanda *Kurdên Sovêtê*, r.109-110.

24 Hejarê Şamil, *Diaspora Kürtleri – "Sovyet Kürtleri" Hakkında Tarihi ve Güncel İnceleme*, (İstanbul: Pêrî, 2005), r. 98-99.

25 Bnr. Mustafa Aydoğan "Destpêka Romana Kurdî: Şivanê Kurmanca", Şivanê *Kurmanca*, Erebe Şemo, (Tîpguhastin. M. Aydoğan), (Diyarbakır: Lîs, 2009), r. 8-16.

26 Di gereke Maksîm Gorkî ya Erîvanê da Erebe Şemo diçe cem wî û pirtûka xwe pêşkêşî wî dike. Gorkî pirtûka Şemoyî bi van gotinan bi qîmet dike: "Gelê Kurd bi zimanê nivîskarê xwe, Erebe Şamîlov qise dike" (Boyîk, 2007: 21).



gerandin. Herweha navê Şivanê *Kurmanca* ji *Berbangê* bêtir balkêş û guncaw bû. Lewra şêweya tevahiya serboriya nivîskarî simbolîze dikir ku di biçûkatîya xwe da şivantî kiribû û piştî temenekî şûn da bûbû pêşengê civaka xwe. Ji hemûyan giringtir, berhema herî zêde li ber dilê nivîskarî şêrîn, Şivanê *Kurmanca* bû.<sup>27</sup> Wer xuyaye sedema sereke ya venivîsandina otobiyoğrafîya Şemoyî polîtîk e di çarçoveya pêvajoyê û pêwendîya siyasî da. Sedemên edebî, bi ya me li dû biryardayîna jinûvenivîsandinê, jixweber derketine holê. Ji weşandina Şivanê *Kurmanca* (1935) heta vegera nivîskarî ji sirgûnê (1956) bi temamî bîst û yek sal derbas bûne. Di vê navberê da wekî Aydogan jî destnîşankiriye, bivênevê di warê zimên û edebiyatê da pêşveçûnek çêbûye ku wekî li jor hatiye nirxandin di veguherînên şêweyî yê *Berbangê* da tên xuyakirin. Guherînên rewşa polîtîk û civakî yê di vê pêvajoyê da jî bi giştî di destwerdanên naverokî, kêmkirin, lêzêdekirin yan jî veguherînên naverokî da tên xuyakirin.<sup>28</sup>

Di *Berbangê* da lêzêdekirina beşeke bi navê *Name ji Amerîkayê*, guherandineke biçûk di beşa Çi *terane vilke* da, jêbirina pasajekê ya derbarê leşkerên rûs da ji *Li Welatê Romê, Kilama Siyabendê Silêvîn û Xeca Zer*, hesasiya li ser behskirina ermeniyana, di beşa Şerê *Bajarvaniyê* da çêkirina diyalogekê ku tê da bêjeya cihû (yahûdî) derbas dibe û hwd. dikare bi sedemên polîtîk ra têkildar, wek destwerdanên polîtîk bîn nirxandin.

Di Şivanê *Kurmanca* da di beşa Çi *terane "vilke?"* da mamosteya Erebe, wî bo birina nameyekê ji mêrê wê ra peywirdar dike. Erebe diçe bajêr, nameyê radestî mêrê mamosteya xwe dike. Li wir, berî vegeerê xwarinê didin ber Erebe. Erebe di jiyana xwe da cara ewil kêr û çetelan li wir dibîne, dibêje qey ew pêlîstok in û diyariyê wî kirine. Loma wan dixê berîka xwe. Ji ber vê bi dizîyê tê tawanbarkirin. Cîran bi dengê wan dihesin û dicivin. Di nava qebralixiyê da çend jin, hemû kurdan bi dizî û qaçaxiyê tawanbar dikin. Ev jin, wek jinên ermenî hatine destnîşankirin. Lê em di *Berbangê* da dibînin ew rengdêra ermenî hatiye rakirin. Diyar e Erebe Şemoyî di *Berbangê* da li ser bikaranîna bêjeya ermenî û konteksta wê hesas e. Di *Berbangê* da wî xuyangên ku nakokîya kurd û ermeniyana destnîşankirî jê birine, yê têkiliyên erênî yê kurd û ermeniyana destnîşankirî lê zêde kirine. Bo nimûne di Şerê *Bajarvaniyê* da Erebe jî ber nexweşîya tîfroyê li Vladîkavkazê çendekî di nexweşxaneyê da dimîne. Rojekê Artêşa Spî bajêr dagir dike û li her derê li komunîstan digerin. Ji ber metirsiya berdestbûnê Erebe jî nexweşxaneyê derdikeve, diçe li "ew ermeniyêd revîbûn ji hêsîriyê hatibûn" (r. 103) digere bo hewara xwe bigihîne wan. Ev yeka gelek manadar e ku hem qewimînên dema nêz bi bir dixê û hem jî têkiliyên germ û dostaniya kurd û ermeniyana derdixê pêş. Di heman beşê da xuyangeke gelek balkêş li *Berbangê* hatiye zêdekirin. Leşkerên ku li komunîstan digerin -çi balkêş e- ne jî ber komunîstbûnê, bi awayekî bêwate ji yahûdîbûna Erebe dikevin şike:

Rengê minî qemer, serê min kurnekirî û rûyê minî dirêj bûbûn, şika wan çû min, wekî ez yahûdîme -cihûdim.

-Tu cihûdî? -Ez vî alî, wî alî dihejandim.

-Na, ez kurdim.

-Derewa dikî... Ez avêtime erdê û bi şîşe tivinga kutam (r. 102-103).

Serbijîşk, Erebe jî destê wan digire, lê ew dîsa gefan li vegêr/lehengê me dixwin. Ev diyaloga ku di Şivanê *Kurmanca* da tune, wer xuyaye bi sedemeke polîtîk di *Berbangê* da hatiye çêkirin bo bibîrxistina komkujiya yahûdîyan. Bi vê yekê Şemoyî bi awayekî neyekser kiryarên Almanayê yê li ser yahûdîyan destnîşan û rexne kirine. Eger bê zanîn wê demê Yekîtiya Sovyetê û Almanya dijminên hev bûn, armanca polîtîk a nivîskêr di çêkirina vê diyalogê da bêtir berçav dibe.

Li *Berbangê* zêdekirina beşeke bi navê *Name ji Amerîkayê* jî divê di çarçoveya têkiliyên Yekîtiya Sovyetê û dewletên din û sedemên polîtîk da bê nirxandin. Ev beş jî wekî diyaloga li jor behskirî, esas giringiyeke xwe nîne di jiyannameya nivîskêr da û heta cihdayîna wan piçekî bêwate ye. Lewre pêwendî, girêdan û giringiyeke wan a xurt nîne di tevahiya vegêrana jiyana nivîskêr da û bi ihtîmaleke mezin her du jî ji rastiyê bêtir fiksiyon in. Diyar e nivîskarî jî bo destnîşankirin û dupatkirina helwest û fikrên xwe yê polîtîk pêwîst dîtiye lêzêdekirinên wiha di venivîsandina otobiyoğrafîya xwe da bi cih bike. Di beşa *Name ji Amerîkayê* (r. 35-45) da hin ferdên malbata axayê Erebe -Îvan û hevîna xwe- bi hevî û bendewariyên mezin ku dê pir dewlemend bibin, hemû hebûna xwe difiroşin, di ser da deyn dikin û diçin Amerîkayê. Lêbelê hevî û bendewariyên wan nayên cih, malbata ku li welatê xwe dewlemend bû, li Amerîkayê dikeve nava lepên pêrîşanî û belangaziyeke nedîtî. Eger em têkiliyên Yekîtiya Sovyetê û Amerîkayê, heta demeke dirêj bi awayekî fermî nepejirandina Yekîtiya Sovyetê ji aliyê Amerîkayê ve, avakirina NATOyê li ber çavan bigrên hingê tê famkirin ka çima Şemoyî di otobiyoğrafîya xwe da cih daye beşeke wiha û Amerîka reş kiriye. Bi rêya vê çîrokê nivîskarî danberhevdanek di navbera Yekîtiya Sovyetê û Amerîkayê da kiriye, hem jî aliyê aborî û hem jî aliyê civakî ve aliyên baş ên Yekîtiya Sovyetê derxistine pêş û jî bo Amerîkayê jî wêneyekî gelek reş û nexweş

27 Bavê Nazê, "Hevpeyvîna bi Erebe Şemo re ya Berî 25 Salan", r. 32.

28 Mustafa Aydogan "Destpêka Romana Kurdî: Şivanê Kurmanca", r. 28-29.

çêkiriye. Herweha bi awayekî neyekser di temsîliyeta Amerîkayê da pergala kapîtalîst rexne kiriye.

Di danberhevdana Şivanê *Kurmanca* û *Berbangê* da tê dîtîn ku ji ber sedemên polîtîk nivîskarî, di venivîsandina otobiyoğrafîya xwe da oto-sansûr li xwe kiriye. Piştî kuştina mêrê meta xwe Erebe, êdî nikare li Sarîblaxê bimîne, di alaya qazaxan da dibe dîlbend û bi wan ra diçe welatê Romê, yanî sînorê Osmaniyan û Rûsyayê ku wê demê Rûsyayê dagir kiribû. Di beşa *Li welatê Romêda. Kilama Sîyebendê Silêvîn û Xedcê da* behs ji kiryarên nebaş, zordarî, destdirêjî, neheqiyên leşkerên rûs ên li dijî gelê herêmê hatiye kirin. Tê dîtîn ku di *Berbangê* da nivîskarî di vê mijarê da vegêrana xwe sansûr kiriye û çavdêriyên xwe veneguhezîne. Bo nimûne ev pasaja di Şivanê *Kurmanca* da, di *Berbangê* da bi cih nekiriye:

Ew welatê Romêyî eskerê Ūris zevt kiribû, riat tijî têda hebû. Min ber çavê xwe dît, çewa qazaxa û zabite wan zor didanê riatê. Talan dikirin, jin şuhurandin, merî kuştin cîyê bela sebeb, çibêjî. Gunê min gellekî wan belengaza dihat, ez cara diçûme dûr ber kevira, digrîyam. Seva wan belengeza zêre-zêre wan û lûbe-lûbe wan. Ez dizîkava digrîyam, wekî bidîtana, wê ez jî bikuştama

Gelle jina tivinge destada yan qirme destada şer dikir, namusa xwe xwey dikirin, ji dest wan zulumkara (r. 132).

Ji ber agahiyên di pasajê da îmajeke gelek xirab derbarê leşkerên rûs da çêdibe. Dibe ku rayedarên Yekîtiya Sovyetê ji van dîmenan nerihet bûne û ew ji nivîskarî ra diyar kirine. Yan jî belkî ji ber îhtîmala nerazîbûna rayedaran û xweparastinê Şemoyî jixweber ev pasaj di *Berbangê* da ji vegêrana otobiyoğrafîya xwe derxistiye.

Nivîskar, di Şivanê *Kurmanca* da bi diyalog û xuyangên zindî bîranînên xwe yê derbarê zordarî û çavsooriya leşkerên rûs da bi taybetî di çarçoveya çîroka malekê da vedibêje ku çend jinên kurd bi tenê tê da dijîn. Zabit alkolê vedixwin û her tim diçin ber wê malê, destdirêjiyê li wan jinan dikin. Erebe ji van tevgerên nerind gelek aciz dibe, xwe ranagire û îfraz dike. Ji ber îfrazê wî lê dixin û wî ditirsînin. Şeveke ku dîsa tîncîzîkirin jinên malê gule berdidin û tacîzkeran birîndar dikin. Bi vê rûdanê haya fermanarî ji şixulên nelirê yê zabitan dibe, dixwaze bi wan jinan ra biaxive û rewşê zelal bike. Erebe dîlbendiyê dike di navbera jinan û fermanarî da. Dûre baweriya jinan bi Erebe tî û tîkiliyeke baş di navbera wan da çêdibe. Şemoyî di *Berbangê* da cih nedaye vê rûdanê û yê bi vî rengî. Lewre vegêrana rûdanên wiha amaje bi kiryarên nebaş ên leşkerên rûs dike û îmajeke wan a neyînî çêdike.

Nivîskarî li hin cihan bi destwerdanên polîtîk agahî û rûdanên nû li vegêrana otobiyoğrafîya xwe zêde kirine. Wek mînak dema li Sariqamişê di karê çêkirina rêya hesin da dixebite bi rêya tîkiliyên karkerên Bolşevîk bi fikr û nêrînen sosyalîst ra hevnas dibe. Bi kirina peywîrên biçûk ên veşartî ew roj bi roj dikeve nava xebatên sosyalîzmê. Rojekê Erebe bi dizî kaxezên Bolşevîkan belav dike. Di Şivanê *Kurmanca* da vê peywîra xwe, di hevoka “[m]in kaxez ji çamadana derxist, kire xurcika Earif avîte ser millê xwe, bir, bela kir, hatim” (r. 147) da bi vegêraneke gelek kurtkirî vediguhezîne. Di *Berbangê* da pêvajoya belavkirinê bihûrgilî radigihîne ka kaxez li ku derê, li kê û çawa belav kirine. Herwekî din pêvajoya piştî belavkirinê, bi rêya diyalogê bi Mîxaylovî ra naveroka kaxezan jî eşkere dike. Xwîner pê dihesîne ku kaxezên belavkirî, tezên Lenîn bûne. Bi vê hincetê nivîskar derbarê tezên Lenîn, karîgeriya wan a li ser pale û leşkeran da agahiyên dide (r. 85-86).

Wer dixuye Erebe Şemoyî di *Berbangê* da herî zêde di mijara partiya Daşnak da midaxaleyên polîtîk kirine. Di Şivanê *Kurmanca* da Şemoyî di beşa *Li firqêda*, bi taybetî jî di beşên *Şerê grajdaniyê* û *Dîsa nava kurmanca da* rexneyên gelek tûj li partiya ermeniyên, Daşnakê kirine. Ji ber kirin û polîtîkayên wê ew bi xuyanga Romê, burjuwaziyê, axa û beg, partiyên dij-Bolşevîkan ra wekhev daye zanîn. Bi rik û hêrs behsa wê dike, bi giştî wê bi neteweperestî, şerxwazî, dijminiya gelî, alîgiriya burjuwaziyê tawanbar dike: “[m]ûsevata, daşnaka û mênşevîk xebateke mezin dibir nava milletada, hazir dikirin şerê xwe-xwetiye, millet bidana qirê” (r. 162); [B]er çavê xwe min dît, çewa daşnaka gundiye kesîb talan dikirin” (r. 176). Piştî biserketina şerê bajarvaniyê partiya komunîst bo bicihkirina pergala sosyalîst peywîran didin Erebe Şemoyî, jê dixwazin ku di nava kurdan da fikrên sosyalîst belav bike, kurdên Sovyetê birêxistin bike û pergala sosyalîst bide rûniştandin. Şemo ji bo bicihanîna peywîrên wiha di 1924an da diçe Rewanê û di gundên kurdan da dixebite. Şemo di Şivanê *Kurmanca* da ji bîranînên wê çaxê axaftinên gundiyan vediguhezîne derbarê jiyana berê da. Nivîskarî di axaftinên gundiyan kurd da gelek cih daye rexne û tawanbariyên derheqê Daşnakan da. Di wan diyalogan da tê ragihandin Daşnakan wek hevkarê Romê, axa û begên kurd, bi hev ra zilm û zordariyeke nedîtî li gundiyan kurd kirine, ew talan û qir kirine. Herweha di berhemê da bal hatiye kişandin ser neteweperestiya partiya Daşnakê, ew bi qirkirin û cihêkariya gelan jî hatiye tawanbarkirin:

[w]extê tu ji cem me çûy, dîwan kete destê daşnaka. Daşnaka dest pê kir kurmanc qir kirin. Rojê danekê xûmpê wan bi xûmpapête xweva ser gundekîda digirtin. Nîvekî kurmanca ji gundê xwe direvîyan Begêd me, axalêrêd me jî çûne piştê daşnaka (r. 188); [d]îwana daşnakada xerc bê hesab bû. Ximpapêta rojê danekê nav meda bûn, em talan dikirin, wekî hespeke yekî rind hebîya yan dewareke yekî rind hebîya, ber derê wî nedihîştin, talan dikirin, dibirin (r. 189); [w]extê daşnaka zulm ketibû rû erdê, îsanet hevdu dixwar. Kesîb, belengaz, fiqare, -tev birçî bi-

bûn, xelayî ketibû nava wan, seva kerî nan-hevdu dikuştin (r. 194).

Di *Berbangê* da nivîskarî ev rexneyên tûj û tawanbariyên derbarê Daşnakan da tev ji vegêranê derxistine. Di behsa Daşnakan da nivîskar di *Berbangê* da bi temamî bêdeng e û leheng jî nedane axaftin. Dibe ku ev guherîn bi pêvajoya demê ra têkildar be. Wek binecihekî Ermenîstana Sovyetê -herçiqas polîtîkayên Daşnakê ji aliyê partiya komunist ve nehatibin pejirandin û komunîstan ew bi neteweperestiyê sûcdar dikirin jî- dibe ku nivîskarî bi rexneyên li partiyeke ermeniyane nexwestiyê balê bikişîne.<sup>29</sup>

Digel ku di *Berbangê* da nivîskarî rexne û tawanbariyên derbarê Daşnakan ji venivîsandina vegêrana otobiyoğrafîya xwe derxistiye, bi xwendineke bikitekit xwîner dikare di *Berbangê* da têbigihîje sedema taybet a Şemoyî bo rik û hêrsa li dijî Daşnakê. Di *Berbangê* da nivîskar piştî bidawîbûna şerî vedigere welêt, li dê û bavê xwe digere, dûre diçe Tiflîsê cem xwişka xwe, Gogê. Gogê jê ra radigihîne ku bavê wan hatiye kuştin. Lê tam nizane kê kuştîye, li gor gotegotan yan Daşnak yan Romê bavê wan kuştîye. Ji vê agahiyê em têdigihîjin ku gumana kuştina bavê wî ji aliyê Daşnakan ve, sedema bingehîn e bo rik û hêrsa Şemoyî ya li dijî wan. Lêbelê di *Berbangê* da pêwîst dîtiye vê rik û hêrsa xwe eşkere neke.

## 2. ve(ne)gêrana Otobiyoğrafîyê

Mirov dikare çiqasî jiyana xwe vegêre? Ev pirs derî li pirseke din vedike: vegêraneke yekcar realist çiqas mimkûn e ji ber ku angaştî otobiyoğrafîyê, vegêrana jiyana rasteqîne ye. Berhema kanonîk a Lawrence Sterne, *Tristram Shandyê* (1759), bi awayekî îronîk ev bersivandiyê. Serlehangê romanê, Tristram Shandy dixwaze bi hemû hûrgiliyan jiyanameya xwe vegêre. Lêbelê ji ber vegêrana hemû hûrgiliyan û rêlibervekirina vegêrana bîranînekê li mijareke din, vegêran dixetî. Bi vî rengî vegêran dibe mînakî destpêşxeriyê neskertî. Di çarçoveya nivîsandina otobiyoğrafîyê da mînakî *Tristram Shandy*, mesafeya dema nivîsînê, yanî “ez”a tecrubekirî û dema jiyane, yanî “ez”a tecrube dîke destnîşan dîke. Kiryara nivîsînê tu caran nikare leza jiyane zevt bike, ji ber ku dema nivîsînê jî jiyane her diherike. Destpêşxeriyê Shandy berbiçav dîke ku angaştî vegêrana jiyane bi hemû alî û hûrgiliyan, zêdeyî qeweta vêgêranê ye.<sup>30</sup> Lewre wekî Ünal Aytür jî dibêje jiyane pêvajoyeke neqediyayî, bêserûpê, hevnegirtî, tevlihev û bikitekit e. vegêran jî bi rêya bijartin, vesazkirin, hevgerîna wate û şeweyekê dide wê tevlihevî û aloziya jiyane.<sup>31</sup> Naxwe otobiyoğraf jî hemû jiyane xwe bînavber û bi hemû hûrgiliyan venagêrin, jixwe ev ne mimkûn e.<sup>32</sup> Ew rûdan, serborî, bîranînen giring ji nava jiyane xwe hildibijêrin û bi şeweyê nû vedigêrin ku ev otobiyoğrafîyê dîke vegêraneke îşakirî û wê nêzikî fîksiyonê dîke. Di vê rewşê da qismekî mezin e jiyane li dervêyî sînoren vegêranê dimîne. Ev rewş, di naverok û dema vegêrayî ya romanên otobiyoğrafîk ên Erebe Şemoyî da jî tê dîtin. Dîroka çapkirina her du romanên otobiyoğrafîk ên nivîskêr û agahiyên biyoğrafîk ên derbarê jiyane wî da li ber çavan bê girtin dê bê dîtin ku wî çiqasî jiyane xwe vegêraye û çiqas li der sînoren vegêranê hiştiye.

Şivanê *Kurmanca* di 1935an, di 38 saliya nivîskarî da hatiye weşandin û bi giştî demeke ji xwedêdana Erebe heta 1924an vegirtiye. Yanî 27 salên ewil ên jiyane nivîskarî tê da hatine vegêran. Di navbera dema weşandin (1935) -dema nivîsînê jî kêma zêde wek a nivîsînê ye- û dema vegêrayî da herî kêma 11 sal hene. Yanî di berhemê da 11 salên dawî yê heta 1935î nehatine vegêran. Li aliyê din Şemoyî *Berbang* di 1958an, 61 saliya xwe da weşandiyê. Di navbera Şivanê *Kurmanca* û *Berbangê* da 23 sal navbereke demî heye. Di *Berbangê* da jî dema vegêrayî, wek ya Şivanê *Kurmanca* ye. Di wê da jî nivîskarî behsa jiyane xwe ya heta 1924an kiriye. Di vê rewşê da di *Berbangê* da di navbera dema vegêranê û dema vegêrayî da ferqa demê herî kêma 34 sal in. Nivîskar di derheqê wan 34 salên jiyane xwe da bêdeng e. Wer xuyaye, nivîskarî ew 27 salên ewil ên jiyane xwe, zaroktî û xortaniyê hêjayî vegêranê dîtine. Ew 27 salên Şemoyî şahidiya alozî, guherîn û veguherînên mezin ên dîrokî, serûbiniya cîhanê kirine. Jiyane Şemoyî ya mayîn, ji aliyê ve bi saya -û ji ber- pergala nû çîroka serkeftin û destkeftiyên mezin -helbet di nava yê civakî da- û herweha çîroka têkçûyîn, êş, cezayên mezin ên şexsî ne. Şemoyî di romanên xwe yê otobiyoğrafîk da behsa vî

29 Gelek balkêş e, di *Jiyane Bextewar* (1959) da, ya salek piştî *Berbangê* weşandî, nivîskar dîsa rexneyên gelek tûj li Daşnakan dîke. Wê bi nijadperestiyê, cîhekariya netewî û olî, şerxwazî, zordarî û zilmkariyê tawanbar dîke. Lêbelê nivîskarî di deqbanda têkiliyên xurt û dîrokî yê kurd û ermeniyane da cext bi taybetî daye ser dostaniya berdewam a her du gelan (Kan, 2019: 92-106). Berçav e nivîskarî rêyê hev-sengiyê dîtiye bo vegêrana rik û hêrsa xwe û rexneyên xwe yê ji bo partiya neteweperest ya ermeniyane. Divê bê zanîn, nakokîya ku li vir tê dîtin, ne nakokîyêke nirxandinê ye. Ev nirxandinên ku wek nakok xuya dibin, esasen nakokiyên nivîskarî ne. Wekî di nirxandinan da hatiye tesbîtkirin, nivîskarî di vî mijarê da helwesteke hevgerîna destnîşan nekiriye.

30 Terry Eagleton, *Edebiyat Nasıl Okunur*, (çev. Elif Ersavcı), (İstanbul: İletişim, 2015), r. 123-126; Marina MacKay, *Roman Nedir?*, (çev. Fazilet Akdoğan Özdemir), (İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınları, 2018), r. 63-70. Güneş Kan, *Kürtçe Romanda Anlatıcı, Perspektif ve Söylem*, (Diyarbakır: Dicle Üniversitesi, Doktora Tezi, 2022), r. 129-130.

31 E. M. Forster, *Roman Sanatı*, (çev. Ünal Aytür), (İstanbul: Milenyum Yayınları, 2019), r. 17.

32 Mehmet Narlı, “Otobiyoğrafî ve Roman / Otobiyoğrafîk Roman – Her Roman Otobiyoğrafîktir-Otobiyoğrafîk Olan Roman Yoktur”, r. 906.

aliyê reş û nexweş ê jiyana xwe nekiriye.

Bi gotineke dubarekirî nivîskarî di Şivanê *Kurmanca* da di ser 11, di *Berbangê* da 34 salên jiyana xwe ra gav kiriye. Lê em ji agahiyên biyografîk ên derbarê wî da<sup>33</sup> dizanin ku Şemo piştî Şoreşa Cotmehê ji bo belavkirina sosyalîzmê û bicihkirina pergala nû di nava kurdan da gelek çalak bûye, wek endamê partiye karên siyasî domandine, civînên gel organîze kirine, berhemên siyasî wergerandine. Di çarçoveya politikaya Yekîtiya Sovyetê ya derbarê gelên biçûk da di gelek waran da yên wek perwerde, edebiyat, çand, wergêran, rojname û hwd. da bûye pêşeng di nava kurdên Sovyetê da. Gelek rûdan û geşedanên giring di jiyana wî da pêk hatine. Di vê çarçoveyê da nivîskar di 1920an da diçe Moskovayê, çar salan di zanîngeha Lazaryan da di warê ziman û edebiyata rûsî da perwerde dibe.<sup>34</sup> Di 1924an da di çarçoveya politikaya Yekîtiya Sovyetê ya pêşxistina gelên biçûk da, bi peywirdarkirina partiyê rola rênîşandêr, pêşeng, perwerdekar û ronakbîr digire ser xwe. Li gundên kurdan bo vekirina dibistan û pirtûkxaneyan dixebite, bi pirsgrîkên gelê kurd ra eleqedar dibe. Di 1924an da di civîna “Kurdên Nепartîvan” a li Elegezê lidarxistî wekî nûnerê partiyê li ser V. Î. Lenîn û milletên biçûk axaftinekê dike. Bi peywirdarkirina Ermenîstana Sovyetê bi Îshak Marogulov ra elîfbayeke kurdî bi tîpên latînî amade dike. Di 1930î da xebateke çalak dike di derxistina rojnameya *Rya Teze* da. Di Enstîtuya Dîroka Kulturî ya li Lenîngradê da dest bi xwendinê dike, di 1934an da doktoraya xwe diqedîne. Di heman demê da li wir enstîtuya felsefe, wêje û dîrokê da dersên kurdî dide. Di 1930î da pirtûkên siyasî yên bi navê *Terîqa Rêvolûsya Oktobirê*, *Kolxoz û Kara wî ji Gundîya ra*, *Emîrê Lenîn* diweşîne. Ji A. Araratyan adaptasyonêke bi navê *Koçekê Derewîn* dike û diweşîne. Broşûrên bi navê *Jiyana Lenîn*, *Der Heqê Pirsra Feodalîzmê di nava Kurda da* amade dike. Di *Rya Teze* û kovarên ermenî da dinivîsîne. Hin beşên Şivanê *Kurmanca* di kovareke ermenîkî da bi ermenîkî diweşîne. Di 1931ê da qîsmekî Şivanê *Kurmanca* bi rûsî diweşîne. Di 1934an da di *Konferansa Kurdolojîyê* ya li Erîvanê da axaftinekê dike derbarê rewşa sosyo-aborî ya kurdan da.<sup>35</sup> Di 11 salên di navbera weşandina Şivanê *Kurmanca* û dema wê ya vegêrayî da ligel xebatên navborî, bivênevê di çarçoveya tîkiliyên siyasî da bi gelek şexsiyetên partiyê ra;<sup>36</sup> di çarçoveya xebatên perwerdehî, edebî, kurdnasiyê da bi gelek rewşenbîrên kurd, rêvebirên hikûmetê, kurdologan ra bîranînên wî çêbûne. Lêbelê Şemoyî di Şivanê *Kurmanca* –herweha *Berbang-* da di derbarê bîranîn û serboriyên wan salan, tîkilî û xebatên xwe da tiştêk venegêraye.

Li aliyê din di 1937an da Erebe Şemo bi politîka û sepanandinên Stalîn sirgûnî Sibîryayê tê kirin. Nivîskarî heta 1956an, 19 salan li wir di şertên gelek giran da jiyanêke pir dijwar jiyaye. Bêguman ev salên sirgûnê, beşa herî dilsofîner, xirab, xopan, şermezar a jiyana nivîskarî ye. Herçiqas di zarokatî û xortaniya xwe da hînî dijwariyên mezin ên jiyane bûbe jî bêşik sirgûna Sibîryayê ji bo wî ji dijwariyên jiyane wêdetir bûye. Lewra bi baweriyeye mezin, dilsozî û çalaki hîn di serê xortaniya xwe da ketibû nava xebatên sosyalîzm û şoreşgêriyê, di eniya şer da çend caran birîndar bibû, piştî serkeftinên şoreşê ji bo bicihkirina pergala nû di hemû qadên xebatê da bi awayekî gelek aktif xebitibû. Lêbelê dawîya dawîn ji aliyê wê sîstemê ve bi neheqî hatibû cezakirin û ‘mexdûr’ kirin.<sup>37</sup> Di rewşeke wiha da lêgerîna sedeman, hesabdîtî û pirsyarîkirineke navxweyî, bibîranîna rûdan û tîkiliyên berê, venirxandina fikr û baweriyên bo wan şerkirî, haletê ruhiyeyeke misoger e. Du sal pey vegeerê ra xebata ewil a nivîskêr, venivîsandina jiyana xwe, *Berbangê* ye. Lêbelê di nivîsandina duyem a jiyannameya nivîskar da derbarê sirgûn, sedemên sirgûnê, hest û fikrên wî, haletê ruhiyeya wî da tu agahî, şîrove yan jî nirxandinek tune ye. Nivîskarî, ew salên xwe bi temamî nepenî hiştine.

Otobiyoğrafek dikare hemû jiyana xwe -ya heta dema nivîsînê- binivîsîne û hewil bide tevahiya jiyannameya xwe bi dest bixe. Yan jî dikare bi tenê qonaxeke jiyana xwe binivîsîne. Ji ber vê, hinek bêwate ye ku mirov bikeve pey wê pirsê ka nivîskarî çima hemû jiyana xwe venegêraye. Lê dîsa xwîner û vekoler, eger otobiyoğraf kesekî/e navdar be û bi taybetî behs ji hin serboriyên xwe nekiriye -ku ji zanyariyên nivîskêr ên biyografîk tîkiliyên ku gelek giring

33 Bnr. Eskerê Boyîk, Çanda *Kurdên Sovêtê*; Têmurê Xelîl, *Antolojiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurdên Sovyeta Berê*, (amd. T. Xelîl), (Îzmîr: Na, 2014); Christine Allison, “Otobiyoğrafî, serborî û romana kurdî: ‘Erebê Şemo û peywerên wî’”; Ferhat Yılmaz, *Dasa Şemo û Çakûça Gorkî Xwendineke Berawirdkî li dor Şivanê Kurmanca û Sêbareya Gorkî*; Ebubekir Gören, *Folklorî Kurdî di Romanên Erebe Şemo de*, (Wan: Peywend, 2021).

34 Eskerê Boyîk, “Hîmdarê Edebiyata Kurdî yê Ewîlîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî”, *Kovara W*, 15, (2007), r. 22.

35 Ebubekir Gören, *Folklorî Kurdî di Romanên Erebe Şemo de*, r. 31-34; Ferhat Yılmaz, *Dasa Şemo û Çakûça Gorkî Xwendineke Berawirdkî li dor Şivanê Kurmanca û Sêbareya Gorkî*, r. 54-56; Christine Allison, “Otobiyoğrafî, serborî û romana kurdî: ‘Erebê Şemo û peywerên wî’”, r. 140.

36 Ji hevnasîna bi xebatên Bolşevîkan heta nivîsandina jiyannameyên xwe Erebe Şemoyî bêguman bi gelek şoreşgêr, endamên partiyê, siyasemedaran û hwd. hevnas bûye û dem borandiye. Di bîranînên xwe da ew behs ji çend şexsiyetên şoreşgêr dike ku xebatên Bolşevîzmê dikin û di şerê Bajarvaniyê da şer dikin. Lêbelê derbarê pêvajoyên piştî şoreşê û sazkirina pergala nû da bîranînên xwe venegotine. Herweha piştî avabûna Sovyetan di çarçoveya politikayên YSê yên derbarê milletên biçûk de hevdtînan Şemoyî bi serokên partiyê ra çêbûne. Bo nimûne derbarê rewşa kurdan da hevdtîna Erebe Şemoyî bi V. Î. Lenin ra çêbûye (Xelîl, 2014: 97). Li aliyê din li ser amadekirin û perwerdekirina kadroyên kurdan di 1927an da bi Stalin ra hevdtînan pêk aniyê (Allison, 2014: 140). Lê di her du berhemên xwe da derbarê van hevdtînan da bîranînên xwe venegotine.

37 Remezan Alan, *Bendname li ser Rûhê Edebiyatekê*, r. 196-199.

in û di jiyana nivîskarî da xalên werçerxê ne- dikarin bipirsin gelo çima nivîskarî behs jê nekiriye. Di rewşa Erebe Şemoyî û berhemên wî yê otobiyoğrafîk da ji ber ku di navbera dema nivîsînê û dema vegêrayî da mesafeyek dirêj a demê heye, nivîskarî piştî demeke gelek dirêj berhema duyem a otobiyoğrafîk nivîsandiye û di vê navberê da ligel serboriyên din rûdaneke gelek giring –sîrgûn- di jiyana wî da qewimiye ev pirs derdikeve pêş mirov. Bersiva pirsê herçend bi tenê li cem nivîskarî be jî bi hin zanyariyan mirov dikare hin şîrove û nirxandinan bike. Di vê çarçoveyê da taybetmendiya edebiyata kurdî ya siyasî û îdeolojîk û rengê rejîma Sovyetê –bi taybetî di dema Stalîn da-<sup>38</sup> rê li ber me vedike ku venegêrandina hin serborî û rûdanan em bi du sedeman şîrove bikin. Sedema ewil dikare bi rêbaza edebiyat û hunera demê bê nirxandin. *Realîzma sosyalîst* ji bo armancên şoreşê û pergala sosyalîst, destnîşankirina serkeftiyên şoreşê û bi tenê dayîna wêneyê xweş ê pergala Sovyetê edebiyat wek amrazek didît. Dibe ku ji ber destnîşankirina armanc û serkeftinên şoreşê û propagandaya sosyalîzmê Erebe Şemoyî serboriya xwe bi taybetî heta biserketina şoreşê vegêraye. Pêşî şert û mercên ku bo şoreşê zemînek çêkirine, di nav serboriya xwe û malbata xwe da destnîşan kirine. Paşê di nav serboriya pêş-xortaniya xwe da haydarbûna çînî û îdeolojîk, beşdariya li xebatên siyasî û şoreşgêriya xwe vegêraye. Nivîskarî ji ber girêdana îdeolojîk û ferzkirinên estetîka sosyalîst bi tenê ew wêneyê jiyana xwe daye ku sîstema sosyalîst dipesînine. Li aliyê din venegêrana hin serboriyên nivîskarî dikare bi guvaşa siyasî, bi gotineke din bi hebûna sansûr û oto-sansûrê bê nirxandin. Çawa ku Sovyetê li xebatkarên Radyoya Rewanê axaftinên derbarê pîrsgirêkên navxweyî da qedexa kiribû,<sup>39</sup> herweha di qada edebiyatê da jî sansûr hebû. Ji ber vê di berhemên demê da nemimkûn e rexneyeke biçûk a derbarê pergala Sovyetê da bê dîtin. Bêdengiya Erebe Şemoyî ya derheqê hin serboriyên xwe da –bi taybetî pêvajoya girtin û mayîna demeke dirêj li sîrgûnê- dikare bi (oto)sansûrê bê şîrovekirin.

## ENCAM

Şivanê Kurmanca (1935) û *Berbang* (1958), du romanên otobiyoğrafîk ên Erebe Şemoyî ne. Digel ku *Berbang* 23 sal piştî Şivanê Kurmanca hatiye weşandin ew ne berga duyem a berhema ewil e. Sînoren dema vegêrayî, di her du berhemên da wek hev e, her du berhem bi vegêraneke kurt a serboriya malbatê ya berî xwedêdana Şemoyî dest pê dikin û bi vegêrana bîranînên nivîskarî yê 1924an bi dawî dibin. Herweha naveroka her du berhemên otobiyoğrafîk digel destwerdanên nivîskarî yê di vegêranê da kêma zêde wek hev e. Ji ber vê ligel hin destwerdan, jêkêmkirin û lêzedekirinan *Berbang* venivîsandineke Şivanê Kurmanca ye.

Di vê xebatê da me şîrove kir ka çima Erebe Şemoyî jiyannameya xwe nivîsandiye û jê giringtir çima pêwîst dîtiye jiyannameya nivîsandî -bêyî ku sînoren dema vegêrayî berfireh bike û naverokê ji binî ve biguherîne- ji nû ve binivîsîne. Nivîsîna berhema ewil a Şemoyî ya otobiyoğrafîk, bi sedemên giştî yê nivîsandina otobiyoğrafîyan dikare bê nirxandin. Berçav e, Şemoyî ji ber dozîna xwenemirkinê, ebedîkirina xwe xwestiye jiyana xwe ya şexsî ya ji nezanî û hejariyê ber bi zanatî, jiyaneke adil li derekê qeyd bike. Helbet di şexsiyeta xwe, xîret û pêşketina xwe da afirandina kareterekî îdeal û di çarçoveya *realîzma sosyalîst* da pêşkêşkirina wî wek rol model jî dikare sedemeke giring –heta ya esas- bê şîrovekirin. Li aliyê din destwerdanên di *Berbangê* da -ku li vegêran û naveroka heman jiyannameyê hatine kirin-, êşkere dike ku sedemên nivîsandina *Berbangê* bêtir politîk in. Bi ya me piştî vegera ji sîrgûnê Şemoyî bi refleksên xweparastinê jiyannameya xwe di ber çavan ra derbas kiriye û li gor rewşa serdemê guherînên politîk tê da çêkirine. Herweha berçav e di çavlêgerandina Şivanê Kurmanca da nivîskarî, hay ji kêmasiyên zimanî û edebî jî bûye û di bin navê *Berbangê* da guherînên bi vî rengî kirine. Lewma diyar e endîşe û destwerdanên edebî û pê ra jî yê zimanî jî sedemeke nivîsandina *Berbangê* ye.

Ji aliyê din ve di xebatê da bi berawirdkirina her du berhemên nivîskarî û zanyariyên biyoğrafîk ên derbarê wî da me vekola ka nivîskarî çiqasî jiyana xwe vegêraye û çiqasî wê venegêraye. Di her du berhemên otobiyoğrafîk da nivîskarî, behs ji 27 salên xwe yê ewil kiriye ku bîranînên bijarte yê zarokatî û pêşxortaniyê û şahidiya rûdanên dîrokî, siyasî û civakî vedigire. Di vê rewşê da eger em dema nivîsînê wek pîvan bigirin di Şivanê Kurmanca da nivîskarî ji ser 11 sal, di *Berbangê* da 34 salên dawî yê jiyana xwe ra gav kiriye. Gelek rûdan û geşedanên jiyana xwe venegêrane wek destpêkirin û birêvebirina xebatên edebî, çandî û perwerdehiyê, hevnasî û bîranînên xwe yê bi şexsiyetên navdar ên wek Stalîn, Lenîn, Gorkî û rewşenbîrên kurd ra, sedem û pêvajoya sîrgûnê û hwd. Me venegêrana hin serboriyên nivîskarî bi sedemên îdeolojîk û pêvajoya siyasî, girêdayî van sedeman bi rêbaza wî -*realîzma sosyalîst*- û (oto)sansûrê şîrove kir.

38 Zülküf Ergün, *Edebiyata Kurdî ya Sovyetê*, r. 25-26.

39 Zeki Gürür, *Ez Dibêjim Vê Kilamê Sewa We Dengbêjî di Peywenda Patronajê da*, (Wan: Peywend, 2021), r. 137.

## ÇAVKANÎ

- Alan, Remezan, *Bendname -li ser Rûhê Edebiyatekê-*, (Îstanbul: Avesta), 2009.
- Allison, Christine, “Otobiyografi, Serborî û Romana Kurdî: Erebe Şemo û Peyrewên Wî”, *Wêje û Rexne*, 2, 2014.
- Aydogan, Mustafa, “Destpêka Romana Kurdî: Şivanê Kurmanca”, *Şivanê Kurmanca*, Erebe Şemo, (Tîpguhastin. M. Aydogan), (Diyarbakır: Lîs), 2009.
- Bavê Nazê, “Hevpeyvîna bi Erebe Şemo re ya Berî 25 Salan”, *Kovara W*, 15, 2007.
- Çetin, Nurullah, *Roman Çözümleme Yöntemi*, (Ankara: Öncü Kitap), 2005.
- Denizarslanı Bilginer, Yonca, *Kendiliğin Anlatıları: Çağdaş Amerikan Edebiyatında Otobiyografi*, (İzmir: Ege Üniversitesi, Doktora Tezi), 2010.
- Eagleton, Tery, *Edebiyat Nasıl Okunur*, (çev. Elif Ersavcı), (İstanbul: İletişim), 2015.
- Erebê Şemo, *Berbang*, (Trans. Rêber Dilşêr), (Stockholm: Kurdistan), 1988.
- Erebê Şemo, *Şivanê Kurmanca*, (Tîpguhastin Mustafa Aydogan), (Diyarbakır: Lîs), 2009.
- Ergün, Zülküf, *Edebiyata Kurdî ya Sovyetê*, (İstanbul: Nûbihar), 2023.
- Eskerê Boyîk, “Hîmdarê Edebiyata Kurdî yê Ewîlîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî”, *Kovara W*, 15, 2007.
- Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovyetê*, (İstanbul: Deng), 2012.
- Forster, E. M., *Roman Sanatı*. (çev. Ünal Aytür). (İstanbul: Milenyum Yayınları), 2019.
- Gören, Ebubekir, *Folklorla Kurdî di Romanên Erebe Şemo de*, (Van: Peywend), 2021.
- Gürür, Zeki, *Ez Dibêjim Vê Kilamê Sewa We Dengbêjî di Peywenda Patronajê da*. (Van: Peywend), 2021.
- Hejarê Şamil, *Diaspora Kürtleri – “Sovyet Kürtleri” Hakkında Tarihi ve Güncel İnceleme*, (İstanbul: Pêri), 2005.
- Kan, Güneş, *Îmaja Ermenî di Romanên Kurdî yê Sovyetê da*, (İstanbul: Peywend), 2019.
- Kan, Güneş, *Kürtçe Romanda Anlatıcı, Perspektif ve Söylem*, (Diyarbakır: Dicle Üniversitesi, Doktora Tezi), 2022.
- Lejeune, Philippe, *On Autobiography*, (Ed. Paul John Eakin, Trans. Katherine Leary), (Minneapolis: University of Minnesota Press), 1989.
- MacKay, Marina, *Roman Nedir?*, (çev. Fazilet Akdoğan Özdemir), (İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi), 2018.
- Narlı, Mehmet, “Otobiyografi ve Roman / Otobiyografik Roman – Her Roman Otobiyografiktir-Otobiyografik Olan Roman Yoktur”, *Turkish Studies International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, 4, 2009.
- Sakallı, Fatih, “Burhan Günel’in Romanlarında Otobiyografik Benlikler”, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 9/43, 2016.
- Têmûrê Xelîl, *Antolojiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurdên Sovyeta Berê*, (amd. T. Xelîl), (İzmir: Na), 2014.
- Topçu, Gülşen, *Çağdaş Arap Edebiyatında Otobiyografi*, (İstanbul: İstanbul Üniversitesi, Yüksek Lisans Tezi), 2019.
- Turan, Cihan, “Di Navbeyna Dîrok û Edebiyatê da: Teknîka Biyografi û Otobiyografiyê di Romanên Erebe Şemo Berbang û Şivanê Kurmanca de”, *Destpêka Romana Kurdî – Gotarên li ser Romana Êwra Kavkazê*, M. Zahir Ertekin - Mehmet Yıldırımçakar (Ed.), (Van: Peywend), 2020.
- Yılmaz, Ferhat, *Dasa Şemo û Çakûça Gorkî – Xwendineke Berawirdkî li dor Şivanê Kurmanca û Sêbareya Gorkî*, (Van: Peywend), 2021.
- Zweig, Stefan, *Kendi Hayatının Şiirini Yazanlar*. (çev. Gülperi Sert), (İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları), 2004.

## Extended Abstract

An autobiography is a form of writing about one's past life. In this form of writing, the person's private life, experiences and observations are at the center of the narrative. Generally, clergy, writers, politicians, thinkers, opinion leaders, in short, people who have come to the fore with their success in a certain field tend to write their autobiographies. The author, who has matured and reached a certain level of consciousness, evaluates and makes sense of the backgrounds of his past with his current knowledge and worldview. The author, who recorded his personal life, also gives a historical photograph as a witness of his period. Autobiography is based on the memories of the autobiography subject. In this respect, since the human memory is unreliable and misleading, the information in the autobiography should not be accepted as absolute reality. While the autobiographer tells many facts from his past, he may skip over or deliberately hide some facts, and events. Erebe Şemo lived between 1897-1978. During the period when he lived, very important developments and major events took place in the world, especially in the places where the author lived. In many respects, radical changes have taken place in the world. Erebe Şemo, witnessed developments such as the First World War, the collapse of great empires, the establishment of nation-states, the October Revolution, the establishment of the USSR, the spread of socialist ideas, the Second World War, mass exile and immigration throughout his life. Şemo and his family, like other Yazidi Kurds, are victims of this turbulent period. Born in a village of Kars, in the border region of the Ottoman Empire and Russia, Erebe Şemo, as a Yazidi with his family, and other ethnic minorities in the region, were thrown due to the results of the Ottoman-Russian Wars. The childhood and adolescence of Şemo passed in poverty and misery. He and his family traveled from village to village to earn a living. Meanwhile, thanks to the ethnic diversity of the region, he got to know different cultures and learned many languages. He started to work as a shepherd and a servant in his childhood, went to the city as a young man and worked as a factory worker for a short time and worked as a translator in the Russian army for a few years. While working as a translator, he met socialist ideas and participated in the revolutionary work. He fought in the ranks of the Bolsheviks in the Russian Civil War, and after the war he studied at a university in Moscow. Returning to Armenia in 1924, he worked as an intellectual and leader for the development of the Kurdish people in fields such as education and culture in line with the Soviet Union's minorities policy. He has done many important studies in the field of Kurdish literature and education. He wrote the first Kurdish novel, prepared the Kurdish alphabet, wrote many literary and political works, translated books from other languages, etc. The writer, who played an active role in the struggle for socialism and benefited from the blessings of socialism, was also exposed to great injustices stemming from the policy of Soviet leader Stalin. He was sentenced to exile in Siberia for a long time on baseless accusations. In 1935, Erebe Şemo published his autobiographical work *Şivanê Kurmanca*, which is also the first example of a Kurdish novel. After Siberian exile, he published another autobiographical work, *Berbang*, in 1958. Although there is a 23-year time difference between both autobiographical works, the first 27 years of the author's life are described in both works. No memories, experiences or events of the author's later life are included in *Berbang*. In this respect, *Berbang* is actually a rewriting and another version of *Şivanê Kurmanca* with some changes, deletions and additions. In this article, it was questioned why Şemo needed to write his autobiography, it has been interpreted how much of his life he told, how much he did not tell in his two autobiographical works was examined. It can be said that Şemo wrote his first biography with the basic motives of other autobiographers, namely the desire for immortality and to leave a trace of his life. In addition, the aim of presenting his real life and ideal personality to the society and future generations as a role model and educating them ideologically within the framework of socialist realism, the artistic perspective of the period, can be counted among the reasons for writing *Şivanê Kurmanca*. The reason for writing *Berbang*, which is a rewriting of *Şivanê Kurmanca*, can be explained by literary and political reasons. In both autobiographical works, Şemo included memories from the first 27 years of his life. Şemo did not narrate any memories of the last 11 years of his life up to the time of writing in *Şivanê Kurmanca*, and no memories from the last 34 years in *Berbang*. Both of Şemo's autobiographical works are retrospective and written with a first-person narrator. This narrator is autodiegetic in some places, and in some places the witness/observer "I" narrator.